Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 944 23-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني

# HRRK amadekariya pêşbirka helbestan dike



**HRRK amadekariya Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan ya 2022`yan dike. Berhem wê heta 1`ê Adarê bên qebûlkirin. Helbestvan Ciwanê Abdal têkildarî mijarê got, ciwanên Kurd asoyên nû li helbestê zêde dikin. Ji ber germa hestên wan, nerînên wan jî berfirehtir in.**

Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) tevî Komeleya Janê Xelef a Xêrxwaziyê ya li Brîtanyayê amadehiyên Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan sala 2022`yan dike.

Di sala 2021'an de HRRK'ê yekemîn pêşbirk pêk hatibû. Der barê pêşbirkê û helbestvanên ciwan de helbestvan û nivîskarê endamê HRRK`ê Ciwanê Abdal ji ANHA`yê re axivî.

Ciwanê Abdal got: "Par 25 helbestvan tev li pêşbirkê bûn. A rastî gavên mezin hebûn, ev çalakî rê li ber hemû temenan vedike."

Ciwanê Abdal têkildarî bandora şoreşa Rojava ya li ser ciwanên Kurd wiha axivî: "Bi şoreşê re derfeteke mezin ji bo ciwanan çêbû. Di van salên dawîn de helbesta kurdî bi ser ket, bi awayekî nûjen tê nivîsandin."

Ciwanê Abdal destnîşan kir ku ji ber hestên ciwanan ên tenik, herî zêde helbestên nûjen dinivîsin û wiha got: "Nêrîna ciwanên Kurd di jiyanê de pirtir e; helbestan zû dinivîsin, asoyên nû tev li helbesta xwe dikin. Ji ber germahiya hestên wan nêrînên wan berfirehtir in. Bi vê yekê helbestên hêja û xweş ji ramanên wan derdikevin. Mirov dikare ji wan hîn bibe."

Abdal wiha dom kir: "Lê mirov gelek wêneyan tê re dibîne, tevî wê jî qutkirin tê de heye, ji ber ku divê di ezmûnan re derbas bibin, tecrube ji wan re lazim e heta bigihêjin asteke bilindtir. Ji ber vê yekê divê mirov li ciwanan guhdar be."

Li gorî komîteya amadekar a pêşbirkê, şertên tevlêbûnê wiha ne:

- Pêşbirk bi zimanê kurdî ye.
- Kesên ku beşdarî pêşbirkê dibin, divê ji niştecihên Rojava û Sûriyê bin.
- Divê temenê kesên beşdar di navbera 18-30 saliyê de be.
- Divê helbesta ku beşdarî pêşbirkê bibe li tu deran nehatibe belavkirin û beşdarî pêşbirkan nebûbe.
- Divê helbest ji 10 malikan ne kêmtir û ji 50 malikan ne zêdetir be.

Berhem ji aliyê HRRK`ê ve heta 1'ê Adarê tên qebûlkirin. HRRK dê di 29`ê Adarê de navên xelatgiran li navenda xwe ya li Qamişloyê bi daxuyaniyekê ragihîne.

Xelat jî wiha ne: Helbestvanê yekemîn; 500 dolar, duyemîn; 300 dolar û sêyemîn; 200 dolar.

***ANHA***

# Zimanek jî pê re mir

**Christiana Calderon ya temenê wê 93 salî ku ji kesên dawî yên bi zimanê Yaghanî diaxivîn, koça dawî kir.**

Christiana Calderon ya temenê wê 93 salî ku weke ji kesên dawî yên bi zimanê Yaghanî diaxivî, wefat kir. Christiana Calderon ji ber nexweşiya Covîd 19 li herêma Magnalles ya Şîlî yê jiyana xwe ji dest da. Keça Calderon Lidia Gonzalez ku weke alîgirê Serokê Konvansiyona Makeqanûnê kar dike diya xwe wiha bibîr anî; "Ji ber di dema mirinê de ez ne li gel we me xemgîn im. Lê divê hûn dizanibin ez çi dikim ji bo we û gelê me ye."

**Rêûresma Yaghanî vejand**

Calderon di sala 1928'an de li Isla Navarino hatiye dinê. Wê di temenê xwe de tim hewlda ku rêûresm û baweriyên koçberên kanoyan bidomîne. Ji ber vê yekê jî di nav civaka Villa Ukika de jiyana xwe domand. Weke keseke çalak ya vê civakê di temenekî piçûk de hînî zimanê Spanyolî bû. Ji bo karibe li 9 zarok û 14 neviyê xwe binihêre demek dirêj sêlikên Yaghan çêkir û bi vî awayî rêûresma Yaghanî vejand.

**'Min xwe gelek tenê hîs kir'**

Gelek endamên malbatê ji ber cudakariyê nikarîbûn zimanê Yaghanî hîn bibin. Calderon di axavtina xwe 2016'an de ya li gel El Paisê wiha digot, "Dema xwîşka min Ursula wefat kir, keseke ku bi zimanê dayikê pê re bipeyivim nema. Min xwe gelek tenê hîs kir."

Neviyê Calderon Cristina Zarraga tevî CD'yekî ferhengeka Yaghanî û Spanyolî hazir kiriye û di heman demê de edîtoriya stran û çîrokên gelerê yên Yaghanî kiriye.

Piştî mirina Calderon keseke ku bi zimanê Yaghanî biaxive nema.

***Ozgûr Polîtîka***



## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Bertek | Derketina li hemberî tiştekî, nerazîbûn: Li hemberî kiryarên wî bertek nîşan da. |
| Şênî | Yên li ciyekî ava dijîn: Şêniyên gund cejin pîroz dikirin. |
| Şênber | Tiştên ku mirov dikare destê xwe bide wan û bibîne. Melmûs: Weke kevir, av, dar... |
| Razber | Tiştên nayên girtin û dîtin. Tersê şênber: Weke heskirin, xemgînî... |
| Bîrdozî | Koma fikrên ku di warê siyasî, hiqûqî, zanistî, felsefî û dînî de rê didin ber tevgerên komekê, partiyekê yan rêveberiyekê. Îdeolojî. |
| Guncaw | Tişta bi kêr tê. Mûnasib: |
| Pêman/pêwan | Wesîle: Bi pêmana salvegerê şahiyek hat lidarxistin. |
| Hişmendî | Têgihiştin, zêhniyet: Hişmendiya wî ya derbarê jinan de ne rast e. |
| Vegirtin | Standina erdekî, milkekî bi darê zorê ji kesekî. Dagîrkirin: Welatê me vegirtin. Wateyên wê yên din jî hene. |
| Bişaftin | Helîna hêdî hêdî: Kevaniyê keşk bişaftin û dewê wan berda ser xwarinê. Herwiha bi mecazî tê wateya asîmîlebûn û asîmîlekiriinê jî: Civaka ne azad be tê bişaftin. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | Q | E | R | S | ■ | Ç | Ê | J |
| 2 | A | ■ | Y | ■ | A | S | A | ■ | I |
| 3 | C | O | L | E | M | Ê | R | G | ■ |
| 4 | ■ | T | O | ■ | B | ■ | P | E | Z |
| 5 | Z | O | ■ | Q | A | H | Î | R | E |
| 6 | O | ■ | T | E | ■ | Ê | K | ■ | N |
| 7 | N | O | ■ | R | E | Ş | ■ | D | E |
| 8 | A | J | O | ■ | N | Î | Ş | E | ■ |
| 9 | ■ | E | F | R | Î | N | ■ | M | Û |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 2 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 5 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 6 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 7 | | ■ | | | | | | | |
| 8 | ■ | | | | ■ | | ■ | | |
| 9 | | | ■ | | | | | | ■ |

**ÇEP-RAST**

1. Paytexta Îtalyayê... Plakaya navneteweyî ya Îranê
2. Parlamentoya Rûsyayê
3. Rastêşek... Hazir
4. Bi erebî "ez"... Cure, celeb
5. Diravên ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tê standin... Demên rojê
6. Dema mirinê... Qertafeke neyînî
7. Kesê ku maziyan diçine
8. Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê... Notayek
9. Notayek... Elementên ne metal, mîna klor, fosfor û oksîjenê

**JOR-JÊR**

1. Cureyekî nexweşiya lingên pez
2. Beşeke malê, jûr... Kurteya elementa Aktînyûmê... Peyva neyînî
3. Pirç... Nepêşekar, kesê ku di kar û barê xwe de bi pêş neketiye
4. Firaq... Dua, niyaz
5. Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e
6. Pirsgirêk
7. Xwarinên ji şîr
8. Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî... Kesê ji dê an jî ji bavê mirovî
9. Yezdanekî misrî... Mirêk, neynik

# TEV-DEM: Projeya neteweya demokratîk hêviya gelan e

Hevseroka TEV-DEM`ê: Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi taybetî gelê Kurd wê li seranserê cîhanê, bi têkoşîna xwe armanca Komploya Navneteweyî têk bibin. ***R-4***



Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 944 23-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## KJK: Zimanê dayîkê mafekî civakî ye

Komîteya Perwerdeyê ya KJK'ê li ser Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanî daxuyanî da û got, zimanê dayikê mafekî civakî ye. Ji ber wê astengiya li pêşiya xwendina bi kurdî qirkirina herî mezin e. ***R-2***





# `DÎROK, ERDNÎGARÎ Û ZIMAN BEDEN IN`

KCK'e Roja Zimanê Dayîkê ya Dinyayê pîroz kir û got , ziman ji bo gelekî nasname ye, azadiya raman e, hebûn e; em li nasnameya xwe, azadiya xwe û hebûna xwe xwedî derkevin. Ziman beden e, li bedena xwe xwedî derkevin. R-4









## Çeteyên dewleta tirkî ji Efrînê digel melayê mizgeftê 10 welatî revandin

Çeteyên dewleta tirkî ji navçeya Reco û Cindirêsê yên kantona Efrînê 9 welatî revandin û ji navenda Efrînê jî melayê mizgeftê revandin ***R-3***

## HPG`ê nasnameyên 5 şehîdan eşkere kirin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê nasnameyên 5 gerîlayên li Serhedê şehîd bûyîn eşkere kirin û got, em hevrêyên xwe yên li Serhedê bi tevlibûna xeta fedayîtiyê bûyîn efsane bi rêz û minetdarî bîr tînin û dilsoziya xwe ya bi bîranîna wan re dubare dikin. ***R-3***







## Kaniya zimanê kurdî wê neçike û wê her tim biherike

Biradost Mîtanî: Zimanê Kurdî kaniya herî mezin ya çandên Mezopotamya ye. Tevayiya gelan jê vexwarine û pê bibandor bûne. Ji ber wê divê Kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û kesayetên qelp bi zimanên biyanî ji xwe re ava nekin. ***R-7***



## Basim Osman: Ji ber dorpêçê li Şehba çandinî paş ve çûye

Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Herêma Efrînê Basim Osman diyar kir ku ji ber kiryarên hikumeta Şamê yên li dijî herêmê, îsal mewsima çandiniyê li Şehba wê pirtir zirarê bibîne. ***R-6***



## Qîrîna Siweyda, qîrîn û hawara tevayiya gelên Sûriyê ye


Ednan Xelîfê: Daxwaziyên Civaka Durzî rewa ne û pirsgirêkên wan yên tevayiya gelên Sûriyê ne. Divê Hikûmeta Şamê jî krîzê kûrtir neke û dev ji hişmendiya xwe ya hişk berde. ***R-4***




## `Ziman hebûna me diyar dike`

Parastin, bikaranîn û axaftina bi zimanê dayîkê bingehê hebûna her neteweyê ye û nasnameya her mirovî ye. Kesê zimanê xwe yê dayîkê winda bike, hebûna wî winda dibe û ti wateya jiyana wî ya neteweyî namîne. ***R-6***

Li peyaman û mohrên xwe xwedî dernakevin! Dilyar Cizîrî R-4
Krîza Ukrayna û Konferansa Mûnîhê Zekî Bedran R-5
Kurdî ketiye binê bîreke bêbinî Sîpan Şînda R-7





# KJK: Zimanê dayîkê mafekî civakî ye

Komîteya Perwerdeyê ya KJK'ê li ser Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanî daxuyanî da û got, zimanê dayîkê mafekî civakî ye. Ji ber wê astengiya li pêşiya xwendina bi kurdî qirkirina herî mezin e.

Komîteya Perwerdeyê ya KJK'ê bi pêmana 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate ragihandin, desthilatdariya qirker a li Tirkiyeyê ku ji dirûşmên 'yek milet', 'yek ziman' û 'yek dewletê' derbasî rejîma yek şexsî bûye, bi taybetî li dijî Kurdî polîtîkaya qirkirina ziman dimeşîne û hate gotin, "Bi wesîleya Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî, li çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welat; li her cihê ku gelê me lê ye, her kesên ku ji bo Kurdî bibe zimanê perwerde û hîndekariyê têkoşin, ji bo vê kedê dide û xwedî li zimanê dayikê derkevin, silav kirin û ji ber vê sekna wan a bi rûmet hemûyan pîroz dikin. 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî, li dijî sîstema desthilatdar a netewe-perest û şovenîst ku xwe dispêre yek zîhniyetê, li cîhana me ya pirzimanî nîşan dide; zimanê ku sedema hebûna gelekî ye nabe ku tune bê hesibandin.

21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê, Roja Tevgera Zimanê Dayikê ye. Ji aliyê dîrokî ve ew roj e ku gelê Bangladeşê ji bo karibe bi zimanê xwe yê dayikê bixwîn berdêlên giran daye û di encama vê têkoşîna zehmet de bi ser ketiye. Em xwendekarên zanîngehê yên Bangadeşî ku bi polîsên Bangladeşê re şer kirin û hatin kuştin, ji vê derê bi rêzdarî bi bîr tînin. Tevî ku 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî ji aliyê UNESCO ve hatiye hatiye ragihandin jî, li gorî Nexşeya Zimanên Cîhanê yên dibin Metirsiyê de ne ya UNESCO, li Tirkiye ya ku yek ji 20 welatên endamên UNESCO ye, heta niha 18 ziman ya hatine tunekirin yan jî li ber tunekirinê ne. Ji bo dawî li zext û polîtîkaya astengkirinê ya desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê ya li ser sazî û xebatkarên ziman, çand û çapemeniya Kurd bê anîn, divê UNESCO berpirsyariya xwe bi cih bîne. Banga me li UNESCO ew e; peymanên ku biryar li ser daye, ji bo li Tirkiye û welatên din ên endam bi cih were anîn zextê bike û ji bo zimanên gelên bidest mîna zimanê gelê Kurd bibe xwedî statuyeke siyasî, weke sazî bi rola xwe rabe. Li Tirkiyeyê, desthilatdariya faşîst û qirker ku ji dirûşmên 'yek milet', 'yek ziman' û 'yek dewletê' derbasî rejîma yek şexsî bû, îro bi taybetî li dijî Kurdî polîtîkaya qirkirina ziman dimeşîne. Li çend dibistanan qebûlkirina Kurdî weke derseke hilbijartî, nayê wê wateyê ku li Tirkiyeyê polîtîkaya qirkirina ziman ji holê hatiye rakirin. Ji ber ku hîn jî endamên çapemeniya Kurdî têne girtin. Gelek sazî û xebatkarên ji bo çand û zimanê Kurdî dixebitin di bin zextê de ne, têne girtin."




### DEWLETA SÛRIYE, ÎRAN Û IRAQÊ JÎ KURDÎ QEDEXE DIKIN

Di dewama daxuyaniyê de hate ragihandin ku ji ber zextên rejîma Îranê li Rojhilatê Kurdistanê jî gelê Kurd ji perwerdeya bi zimanê dayikê bêpar hatiye hiştin û hate gotin, "Mamoste Zara Mûhammedî ji ber ku li Îranê dersa zimanê Kurdî dida komek ji zarokên Kurd, beriya niha bi hefteyekê 5 sal cezayê girtîgehê lê hate birîn. Ya rast, di şexsê Mamoste Zara de eşkere bû ku dewleta Îranê polîtîkayeke çawa ya qirkirina ziman li dijî gelê me dimeşîne. Dewleta Sûriyeyê jî li hemberî destketiyên gelê me yê li Rojava ku bi kedeke mezin û berdêla bi hezaran şehîdan hatin bidestxistin, hîn jî Kurdî weke zimanê fermî qebûl nekiriye. Hikumeta Iraqê jî li gel statuya Kurdan a li Başûrê Kurdistanê, li Kerkûkê ku bajarekî piraniya şêniyên wê Kurd e, bi hincetên cuda polîtîkaya qedexekirinê li ser Kurdî dimeşîne. Li ser lewhayên nava bajêr navên Kurdî diguehrîne, li saziyên petrolê axaftina bi Kurdî qedexe dike, derfetên perwerdeyê yên xwendekarên bi Kurdî xwendine kêm dike û bi vî rengî hewl dide ji Kurdî dûr bixîne. Zimanê gelekî beden, azadî û hebûna wî gelî ye. Heta ku bedena Kurdistanê ya ku bi çar parçeyan hatiye parçekirin nebe yek, heta ku hebûn û azadî misoger nebe, jiyan bi wate nabe."

### ZIMANÊ DAYÎKÊ HEBÛNA MIROVAN E

Daxuyaniyê wiha dewam kir: "Hînbûna zimanê dayikê, axaftin û pêşvebirina wê, mafê herî xwezayî, bi wate û civakî ye. Hinceta hebûnê ya mirovan e. Zimanê dayikê nasnameya her zindiyekî li gerdûnê ye. Lê belê bêparhiştina Kurdan ku gelekî ji 40 milyonî ye ji xwendina Kurdî, qirkirina herî mezin e. Hikumeta AKP-MHP'ê li ser ziman û gelên cuda yên li Tirkiyeyê polîtîkaya asîmîlasyon û qirkirina ziman dimeşîne.

Bi wesîleya Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê, em hemû kedkar û saziyên zimanê dayikê yên ku ji bo Kurdî bibe zimanê fermî, statuya qanûnî û bibe zimanê perwerde û hîndekariyê têkoşin, silav dikin. Her wiha bang dikin ku ji bo ev kar hertimî bê meşandin, hîndekarên xurt bêne perwerdekirin, giranî li karên akademîk bê dayin; dayik û bavên Kurd û tevahiya gelê me xwedî li zimanê gelê me derkevin, lewma jî li malê, li kargehan li her derê bi Kurdî biaxivin, zarokên xwe bi Kurdî bidin xwendin, meldoyên Kurdî zêde bikin û li her derê deng vedin."

***ANF***

# Li Minbicê semînerek bi sernavê "Jin di serdema fikrê demokratîk de"

**Jinên Minbicê bi semînera bi sernavê "Jin di serdema demokratîk de" du aliyên girîng yên Şoreşa Rojava nîqaş kirin. Destkeftiyên jinan û girîngiya piştgiriya jinan ji jinan re di her qada jiyanê de.**



Nivîsgeha Jinan a Rêxistinên Civaka Sivîl bi hevkariya Meclisa Jinan a Partiya Sûriya Paşrojê re semînerek bi sernavê "Jin di serdema fikrê demokratîk de" li hola Çand û Hunerê ya Minbicê da.

Di semînerê de endamên Rêxistinên Civaka Sivîl, saziyên girêdayî Rêveberiya Sivîl a demokratîk û partiyên siyasî amade bûn.

Semîner bi rêzgirtinê dest pê kir, dûvre endama rêveber a Nivîsgeha Jinan a Rêxistinên Civaka Sivîl Sozdar Xalid axivî û wiha got: "Projeya neteweya demokratîk ku rêber Abdullah Ocalan pêşkêş kiriye bi hewldana rizgarkirina Rojhilata Navîn ji koletiya dewletên kapîtalîst û sererastkirina şaştiyên ku pergalên sosyalîst kirin, bû."

Sozdar Xalid îdeolojiya azadî pênase kir û da zanîn ku ew di aliyê yekemîn de tê wateya rizgarkirina jinan. Ew jî bi rêya rêxistin û aktîfkirina rola jinan di civakê de pêk tê û wiha pê de çû: "Azadiya civakan ji azadiya jinan dest pê dike û şoreşa bêyî jinê ne pêkan e ew şoreş bi ser keve."

Li aliyekî din jî berdevka Meclisa Jinan a Partiya Sûriya Pêşerojê Îbtîsam Ebdulqadir behsa rola jin û mêran di serdema fikrê demokratîk de kir û wiha got: "Doza jin û mêr ji dozen sereke di civaka me de ye. Ew doz li ser navê ol û kevneşopiyan rastî şêweyên reşkirinê hat."

### BEŞDARIYA MÊR DI ŞOREŞA JINÊ DE NE TÊ WATEYA SERKEFTINA ŞORŞEŞÊ





Îbtîsam Ebdulqadêr da zanîn ku jin di civakê de ji her kesî zêdetir rastî zilm û tundiyê hatiye, bi taybet jî bi navê ol û ev tişt got: "Jin baweriyê bi xwe nake û bi demê re dibe milkê mêr û çawa dixwaze wê bi kar tîne. Di encamê de jin dibe kole."

Îbtîsam Ebdulqadêr diyar kir ku piştî destpêkirina Şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek guhartinên erênî di zihniyeta mêran çêbûn û wiha domand: "Mêran bi jinan re şoreş bi rê ve bir û hewl da civakeke azad bi rêxistin bikin. Ev yek jî guhartineke erênî ye. Lê belê nayê wateya ku şoreş bi ser ketiye. Me ji bo azadiyê her tişt pêk anî. Ji ber divê azadî bi pêş keve, were birêxistinkirin û geşkirin."

Di dawiya semînerê de hate gotin ku divê jin parastina jinê bike, piştgiriya wê û desteka wê di hemû qadan de bike.

***ANHA***

# `Emê tola xwe ji hêzên dagîrker hilînin û rêber Apo azad bikin`

**Yekîtiyên Jinên Ciwan bi daxuyaniyekê komploya navneteweyî ya li ser Rêber Ocalan şermezar kirin û gotin, emê tola xwe ji hêzên dagîrker hilînin û Rêber Apo bi fîzîkî azad bikin."**

Yekitiyên Jinên Ciwan ên Minbic, Tebqa û Reqa ji gundê Minaz ê Kobanê de bi meşekê berê xwe da gundê Elbelûrê û li wir di mala ku rêber Ocalan tê de bû, têkildarî şermezarkirina komploya navneteweyî ya li ser rêber Ocalan daxuyaniyek da.

Di daxweyaniyê de wiha hat gotin: "Em ji vî gundî de ku ji me re bû dibistana neteweya demokratîk ku hemû gel li ser bingeha civaka exalqî û siyasî hembêz kiriye, disekinin û cara yekê mafên jinan da wê komploya navneteweyî ya li ser rêber Ocalan şermezar dikin.

Ji vê dibistanê çirûska azadî û têkoşînê dest pê kir û jê têkoşer derketin û fikir û felsefeya rêber Ocalan belav kir.

Armanc ji vê komployê fikirên rêber Ocalan ku maska dagirkeriya Tirk eşkere kiriye binixumînin. Ji ber fikir rizgariya hemû şêweyên zilm û koletiyê ye.

Ev komplo li engiya hemû kesên PKK'ê xistiye "lîsteya terorê" şermeke li eniya wan e.

Em ê tola xwe ji hêzên dagirker hilînin, azadiya fîzîkî ya rêber Apo pêk bînin. Bimire komploya 15 Sibatê , bimire dagirker û qirker , bijî rêber Apo."

***ANHA***





# Kaniya zimanê kurdî wê neçike û wê her tim biherike

Biradost Mîtanî: Zimanê Kurdî kaniya herî mezin ya çandên Mezopotamya ye. Tevayiya gelan jê vexwarine û pê bibandor bûne. Ji ber wê divê Kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û kesayetên qelp bi zimanên biyanî ji xwe re ava nekin.

**Serbest Etê-Qamişlo**

Bi pêmana Roja Zimanê Dayîkê Ya Cîhanê 21ê Sibatê, lêkolînerê dîroka kurdî û heskerê zimanê kurdî Biradost Mîtanî ji rojanmeya me re axivî.

### `Ziman nasname û hebûn e`

Biradost Mîtanî destpêkê Roja Zimanê Dayîkê Ya Cîhanê li tevayiya gelên cîhanê, bi taybetî gelê Kurd û zimanhezên Kurd pîroz kir û bi vê nirxandinê girîngiya zimên vegot: `Ziman kesayeta neteweyan diyar dike û di nava neteweyan de dide ravekirin û naskirin. Bi riya ziman, hast û erkên neteweyî tên geşkirin. Netewe bi dûrketina ji zimanê xwe, ber bi windabûnê ve diçe. Lewra ziman nasname û hebûna neteweyê ye.

### `Mirov bi xaftina bi zimanê biyanî kesayeteke qelp ji xwe re ava dike`

Biradost herwisa nirxandinên Rêber Apo yên ser ziman bîr xistin û axaftina xwe wiha domand: "Abdulah Ocalan dibêje,`Dîrok, Erdnîgarî û Ziman Beden in`. Di baweriya min de ev gotin ya herî biwate ye. Eger mirov bi zimanê xwe neaxive, ji hebûn û bedana xwe ya rast derdikeve û di hundirê bedeneke biyanî de dijî û kesayeteke qelp ji xwe re ava dike. Ziman xweşikbûna mirov dide nîşandan. Nexasim dema mirov dikeve kûrayiya wî û rêzimên nas dike. Jixwe wateya peyva ziman li gorî zimanzan û lêkolîneran, -min bixwe jî li ser lêkolîn kiriye- ew e ku `zim` tê wateya weldandin, `an` paşgîn e. Ev tê wateya ku peyva ziman dibe weldandan û çêbûna kesayetê û neteweyan."

### `Zimanê kurdî kaniya herî mezin e û tevayiya gelan jê vexwariye`

Lêkolînerê dîroka kurdî herwiha li ser girîngiya zimanê kurdî û bandora wî li ziman û çandên Mezppotamya axivî û ev agahî dan: "Dema mirov bêalî dîrok û çanda Mezopotamya lêkolîn bike, rehên zimanê kurdî yê xurt tên dîtin. Bi zengîniya xwe, zimanê kurdî xwe berdaye nava



tevayiya ziman û çandên din û heta bandor li derveyî herêmê jî kiriye. Zimanê Huriyan (pêşiyên Kurdan) bi belgeyên dîrokî bandor li zimanê Herîglofî yê Misrê kiriye. Herwiha çand û zimanê Huriyan bandor li Hîtiyan û herêma Sûriyê bi giştî kiriye. Tabloyên Ugarêtê yên mûzîkî jî bi ziman, çand û mûzîka nêzî ya Huriyan hatine nivîsandin. Bi hatina gelên Başûrê Mezopotamya jî ku li gorî erdnîgariya wan zimanê wan sînordar bû -li hemberî wê xwezaya Kurdistanê ya dewlemned ku dibe sedema dewlemendbûna ziman kurdî- van gelan bi hezaran peyvên kurdî derbasî zimanê xwe kirin û niha di nava zimanê erebî de bi hezaran peyvên kurdî hene. Tirkan jî bi bi hatina xwe ya herêmê, ji sedî 75 zimanê xwe ji Kurdan girt. Li gorî vê, zimanê kurdî weke kaniyeke herî mezin bû ji bo ziman û çandên din. Her neteweyê ji vê kaniyê vexwariye. Ev jî nîşana xurtbûna zimanê kurdî ye ku pişta xwe bi çandeke dewlemend xurt dike."

Mîtanî herwisa mixabiniya xwe nîşan da û diyar kir ku tevî van rastiyan jî baweriya beşeke Kurdan bi zimanê kurdî kêm e. Lewra di dibistanan de bi zimanên biyanî perwerde bûne. Di encamê de beşek ji Kurdan bûne heyran û pesindarên zimanê biyaniyan.

### `Êriş û qedexekirina ziman bi armanca tinekirina kesayeta kurdî ye`

Li ser êrişên hemberî gel û zimanê kurdî Mîtanî ev şirove kir: "Hem di serdema Emewiyan, hem di vê serdemê de, sîstema sermayedar û rejimên dagîrkerên Kurdistanê ji Ataturk, heta Sedam û rejima BEES êrişên xwe li ser zimanê kurdî dijwartir kirin. Van rejiman bi qedexekirina ziman, şerê qirkirina kesayeta kurdî kir.




### Zimanê kurdî wê her biherike

Biradost Mîtanî herwisa nivîskar, helbestvan, wêjekar û hezkerên zimanê kurdî rêzdarî bîr xistin û xebata wan wiha anî ziman: "Tevî sûcên dagîrkaran û êrişên ji bo qirkirina çandî, kesên welatparêz û hezkerên zimên hebûn û heta niha jî hene. Her çenda li gorî jimara mezin ya Kurdan jimara wan kêm jî bû lê xebateke wan ya bênavber û bibandor hebû. Ji Melayê Cizêrî, Feqeyê Teyran, Ehmedê Xanî, Seydayê Cegerxwîn, Tîrêj, Bêbuhar, Ebdulleh Goran, Şêrgo Bêkes û bi dehan rêzdarên din, tevî vê stemkariyê berhemên giranbiha afirndin. Herwisa ji me re li pey xwe xezîneyek hiştin û kaniya ziman zengîntir kirin. Di gel van rêbingeheke wêjeyî, helbestî û çandî ji me re ava kirin. Ev kesên birûmet bûn hilgirên xetîreya zimanê kurdî. Lê ev xebat bê hêsanî nedihat kirin, ji destê desthilatdaran pir êş kişandin. Ji ber wê li hemberî xebata wan em serî diçemînin"

### `Divê pergala perwerdeya li bakur û rojhilatê Sûriyê ji aliyê cîhanê ve fermî bê dîtin`

Biradost Mîtanî li ser rewşa ziman, meteryal û perwerdeya zimanê kurdî ya li Rojava wiha axivî: "Piştî Şoreşa Rojava, li bakur û rojhilatê Sûriyê, pergaleke perwerdeyê hat avakirin. Zimanê kurdî, suryanî û erebî, bi rêbazên perwerdeyê û li gorî pîvanên naventeweyî tên dayîn. Lê mixabin ev pergal ji aliyê UNISCO ve fermî nayê qebûlkirin û bi hişmendiya xwe ya desthiladarî nêzî vê peweredeyê dibe. Em bang li UNSCO dikin ku perwerdeya li bakur û rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî qebûl bike."

### `Bi perwerdeya bi zimanê kurdî kesyaeta rast tê avakirin`

Biradost herwisa bal kişand ser kêmayiyên bikaranîna ziman li bakur û rojhilatê Sûriyê û ev nirxandin kir: "Mixabin saziyên Rêveberiyê ji aliyê zimanê kurdî ve kêm dimînin û hema hema birayarên wê yên tên dayîn, tev bi zimanê Erebî ne. Em vê gotinê dibêjin, ji aliyê ziman ve Rêveberiya Xweser serkeftin û destkeftiyên mezin bi dest xistine. Bi riya van destkeftiyan û bi perwerdeya bi zimanê kurdî, jinûve kesayeta kurdî ya rast û durist tê avakirin. Weke Abdullah Ocalan dibêje,`Min bi hizirê xwe xeta kurdîtiya şaş zîvirand û rast kir`. Bi perwerdeya bi zimanê kurdî ya li Rojava jî xeta kurdîtiyê rast tê avakirin. Zarokên me bi zimanê xwe mezin dibin û li gorî kurdîtiya rast mejî û bedena wan ava dibin."

### `Kurdno li zimanê xwe xwedî derkevin`


Biradost Mîtanî bi vê peyamê axaftina xwe Qedand: "Banga min ji gelê Kurd re ew e ku li hişmendiya girêdayî evîna zimên xwe vegere, zimanê xwe wisa sivik nebîne û berjewediyên aborî û kesayetî li ser zimanê xwe nepejirîne. Lewra xwedîderketina li ziman xwedîderketina li hebûn, kok û eslê xwe ye."


# Nivîskar Mihemed Seyîd Hisên koça dawî kir

**Nivîskar Mihemed Seyîd Hisên Sîtî yê ji gundê Til Erbîd yê bajarê Qamişlo 11ê Sibatê ji ber nexweşiya rebû (bîntengî) jiyana xwe ji dest da.**

Mihemed Hisên sala 1943`yan ji dayîk bûye û di 80 saliya xwe de koça dawî kir. Nivîskar Mihemed ji piçûkaniya xwe ve li bajarê Qamişlo bi cih bûye û lê dijiya. Demekê li welatên derve dimîne lê di dawiyê de vedigere ser xaka welatê xwe.

Bi hezaran xelkên bajarê Qamişlo û nivîskarên Kurd tevlî marasima cenazeyê Mihemed Seyîd Hisên bûn. Nivîskar Mihemed Hisên bi heskirina xwe ya ji wêje û zimanê kurdî tê nasîn. Nêzî 20 pirtûkên wî li ser lêkolîn, çanda zimanê kurdî, helbest û çîrokên kurdî hene.





## Kurdî ketiye binê bîreke bêbinî

**Sîpan Şînda**

Li aliyê me meseleyek weke pêkenok di nava gel de tê gotin. Dibêjin şevekê leşkerên romê diçine gundekî û li ser malekê de digirin. Di wî heyamî de ji kêm kesan tirkî dizanî. Heke keyxwêyan ji leşkeran çend gotin bigirtan da ku xwe ji wan biborînin xera Xwedê bû. Yan jî ne ti kesê pêdivî bi tirkî hebû û ne jî extûbar bi tirkî dikirin. Leşker dibînin ku nikarin bi xwediyê malê re peywendiyê daynin. Dibêjin ka herin bangî keyxwê bikin bila bê vêdê. Yek diçe mala keyxwê û jê re dibêje eve leşker hatîne li ser mala me de girtîne û gazî te dikin. Keyxwê yê reben jî ditirse, lê belê bivênevê diçe. Çend gotinan dibêje û tirkiya wî jî xelas dibe û keyxwê tê re dimîne asê. Xwediyê malê jî li hêviyê ye ku keyxwê berdevkiya wî bike û her dibêje ez bê guneh im. Lê belê keyxwê nikare wergerîne tirkî. Mêrik dibêje ka tu çima ji leşkeran re nabêjî? Keyxwê jî dibêje, mala te Xwedê ava kirî, ma ka ezê vê şêvreşê çawa Kurdî û Tirkî ji hev cuda bikim. Ma ku tu bî tê bi karibî di vê tariyê de ji hev derxî. Ev mînakên wiha di nava gel de gelek in.

Lê mixabin îro ev rewş li bakûrê Kurdistanê berûvajî vediguhere û heke rewş halê dewam bike hetanî çend salên din wê kesek bi kurdî biaxive li bakurê welêt nemîne. Her çenda hinek kesên xemxurên ziman û çend sazî di vî warî de di nava keft û leftê de ne û dikin qîr û hawar jî, lê belê tişta xuya dike Kurd hema li ber kamêrayê bi Kurdî diaxivin û piştî kamêra tê girtin kurdîaxaftin jî diqede. Ji bona zarokên Kurdan li bakurê Kurdistanê waneyên bijarte hilbijêrin gelek kesan û çend dezgehên Kurdan qederek hewldan kirin di vî warî de. Lê belê ez nizanim ka ev gihîşte çi encamê.

Armanca her malbat, civak û neteweyê ew e ku ziman û çanda xwe dewrî nivşên nû bikin û hişmendiya xwedî lê derketina wê bide wan e. Lê belê welê xuya ye ku çi armancên Kurdan yên vî mîratê xwe dewrî nivşên nû bikin nîne. Ez mînakeke rojane bidime we. Di 16ê Adarê de li Hollanda hilbijartina meclîsa bajarvaniyê heye û Kurdan jî berendamek ji meclîsa bajêrvaniyê re derxistiye. Lê belê tişta bala min kişandî, broşûrên vê berendamê bi tirkî ne! Erê li welatê Hollanda hilbijartin çêdibin, berendama Kurdan jî ne bi Hollandî, bi tirkî xwe dide naskirin û dengan dixwaze. Min çend broşûrên berendamên tirkan jî dîtin, lê belê yên wan bi Hollandî bûn. Tiştekî balkêş e newe!

Neyarên Kurdan hingî ketine binhişiya Kurdan û Kurdî ewqasî li ber çavên wan reş kirine, êdî mirov zêran jç bide Kurdan mirov nikare kurdî li ber çavên wan şîrîn bike. Ango kurdî îro ketiye binê bîreke ewqasî kûr û tarî, êdî derxistina wî ji wê bîrê gelekî zehmet e. Ya rast min ne niyet bû ku ez êdî li ser vê mijarê binivîsim. Lê belê ji ber 21ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ji min hat xwestin ku ez nivîsa xwe ya vê hefteyê li ser vê mijarê binivîsim. 21ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî li Kurdên li Kurdî xwedî derdikevin pîroz be.

# `Ziman hebûna me diyar dike`

**Parastin, bikaranîn û axaftina bi zimanê dayîkê bingehê hebûna her neteweyê ye û nasnameya her mirovî ye. Kesê zimanê xwe yê dayîkê winda bike, hebûna wî winda dibe û ti wateya jiyana wî ya neteweyî namîne.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Roja 21'ê Sibatê ji aliyê UNESCO ve wek "Roja Zimanê Dayîkê yê Cîhanê" hatiye hilbijartin û li seranserê cîhanê wek rojeke pîroz tê dîtin.
Zimanê kurdî di dîrokê û dinyayê de ji zimanên herî kevnar e. Bi dehan cihên dîrokî yên ku dergûşa şaristaniyê ne, şopên vî zimanî heta roja me ya îro parastine. Li rojavayê Kurdistanê bi sedhezaran şagirt û xwendekar bi zimanê xwe yê zikmakî bi "zimanê kurdî" perwerdeya xwe dibînin û fêrî zanistê dibin.
Derbarê mijarê de Hevserokê Fakûlteya Wêje û Zanistên Civakî ya Zanîngeha Rojava Darwîn Darî 21'ê Sibatê di serî de li şehîdên azadiyê, Rêber Abdullah Ocalan û li tevayiya Cîhanê pîroz kir û axaftina xwe wiha domand: "Zimanê kurdî hebûn û mayîna Kurdan diyar dike. Eger zimanê kurdî nemîne wê demê hebûna Kurdan jî namîne."
Darwîn got, sala 1987an min xwe fêrî zinamê kurdî kir. Wê demê seydayê Cegerxwîn em fêr kirin. Me bi dizî xwe fêr dikir. Lewra desthilatdariya rejima Sûriyê li



ser me hebû. Em neçar bûn ku bi rengekî feşartî xwe fêr bikin.

**`Gavên mezin ji bo pêşxistina zimanê kurdî hatin avêtin`**

Darwîn Darî da zanîn ku bi fikir û felsefeya Rêbertiyê, herwiha bi saya ked û têkoşêna Şoreşa Rojava, gihîştine astekeke pir bilind, êdî her kes eşkere perwedeya bi zimanê kurdî dibîne û ev li axaftina xwe zêde kir: "Piştî Şoreşa Rojava li bakur û rojhilatê Sûriyê xwendina bi zimanê kurdî sal bi sal pêş ket. Herwiha xwendekar dibistan û zanîngehên bi zimanê kurdî çêbûn. Gavên pir mezin ji bo pêşxistina ziman hatin avêtin. Em bi van gavan pir kêfxweş in."

**Zor û zehmetiyên destpêkê**

Darwîn bîr xist ku dema dibistanên kurdî vekirîn û dest bi dayîna perwerdeya bi kurdî kirîn rastî gelek zor û zehmetiyan hatine û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Destpêkê me hem ji aliyê rejimê hem ji aliyê malbatan ve zehmetiya dikşand. Lewra rejimê zimanê me qet qebûl nedikir û dixwest rê li pêşiya berwedana me bigire. Herwiha baweriya malbatan jî bi perwerdeya bi zimanê kurdî nedihat. Xwendekarên li dibistanan jimara wan pir kêm bû. Zehmetî û êşa herî mezin ew bû ku hin ji malbatên me yên Kurd bi zimanê xwe ne bawer bûn. Heta niha jî beşek li civakê li dijî perwerdeya bi zimanê dayîkê ye. Gelekan jê wisa didît ku zimanê serdest ew e yê ku nûnertiya wan dike ne zimanê dayîkê. Lê rojbiroj ev fikir di nava civakê de hat guhertin û civakê bixwe pêwîst dît ku zarokên xwe fêrî zimanê dayîkê bikin. Ji bo wê jî niha bi sedhezaran zarokên me li dibistanên xwe û bi zmanê xwe xwendina xwe dikin. Ev ji bo me hebûnek e. Eger civak zimanê xwe girîng nebîne û qebûl neke, kesên din qebûl nakin. Dema em hebûna xwe diyar bikin wê her kes hebûna me li ber çavên xwe bigire."
Darwîn Darî got, rast e dibistan û zanîgehên me hatine vekirin û perwerdeya bi kurdê tê dayîn, lê heta niha zimanê kurdî fermiyeta wî nehatiye qebûlkirin. Em dibêjin wê rojek were û wê zimanê me fermî were qebûlkirin. Çimkî berwerdan berdewam e û wê têkoşîna me ya ji bo pêşxistina zimanê dayîkê dewam bike.

**`Paşguhkirina zimanê dayîkê şermeke mezin e`**

Darwîn Darî got, pêwîst e Kurd tev li zimanê ji pêşiyan wek mîras mayî xwedî derkevin û bi awayekî baştir fêrî nifşên nû bikin. Şermeke pir mezin e eger mirov xwe fêrî zimanê xwe neke û pê neaxive û nenvîse. Gelê Kurd ne îro tenê, divê her roj bi kurdî bixwîne, bihizire, biaxive û binivîse. Qirkirin û qedexeyeke dijwar li ser zimanê me hebû, ji ber wê pir girîng e ku em zimanê xwe pêş bixin û çanda xwe geş bikin.
Darwîn diyar kir ku tişta ku mirovan ji zindiyên din cuda dike ziman e û xaftina xwe wiha domand: "Dema dagîrker dixwazin civakekê tine bikin, destpêkê êrişî ziman dikin. Lewra ziman hebûn, çand û nasname ye. Niha jî Ji bo ku gelê Kurd were tinekirin, dewleta tirkî ya dagîrker û hevkarên wê, êrişî ziman û çanda me dikin. Lê bi fikir û felsefeya Rêber Apo û Şoreşa Rojava zimanê me pêş dikeve û hebûna me tê diyarkirin."

**`Li şoreşa ziman xwedî derkevin`**

Hevserokê Fakûlteya Wêje û Zanistên Civakî ya Zanîngeha Rojava Darwîn Darî di dawiya axaftina xwe de bang li gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî gelê Kurd kir ku li şoreşa ziman xwedî derkevin û got, divê em xebateke xurttir bikin û em bi hêvî ne kesê heta niha tevlî şoreşa ziman nebûyî ew jî tevlî bibe û milê siyasetê bi ziman ve girê nede.

# Basim Osman: Ji ber dorpêçê li Şehba çandinî li paş maye

**Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Herêma Efrînê Basim Osman diyar kir ku ji ber kiryarên hikumeta Şamê yên li dijî herêmê, îsal mewsima çandiniyê li Şehba wê pirtir zirarê bibîne.**

Kantona Şehbayê bi erdê xwe yê berhemdar navdar e. Cotkar bi giranî genim û ce diçînin. Herwiha axa wê ji bo çandina sebzeyan jî pir baş e.
Li gorî daneyên Komîteya Çandiniyê, piraniya zeviyên çandiniyê yên kantona Şehbayê ji bo çandina genim û ceh hatine



diyarkirin û rûbera wê digihêje 10 hezar hektaran.
Hikumeta Şamê siyasetên xwe yên keyfî li ser kantona Şehba ferz dike, nahêle madeyên bingehîn derbasî herêmê bibin û ev yek bandoreke neyînî li çandiniyê dike. Nirxê bermîla mazotê îsal gihaştiye 450 hezar lîreyên Sûriyê. Lê di sala borî de 200 hezar bû. Her wiha nirxê tûrika semadê bûye 120 hezar lîreyên Sûriyê ku sala borî bi 60 hezar lîre bû.
Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Efrînê Basim Osman destnîşan kir ku îsal li herêmê gelek zehmetî çêbûne. Osman wiha axivî: "Ji ber siyasetên hikumeta Şamê, nebûna semadê, bi taybet semada Yorya û nebûna dermanên çandiniyê, rûberên çandiniyê kêm bûn û em negihaştin pêkanîna rêgeza xwetêrkirinê."
Osman diyar kir ku şênî nikarin



zeviyên li eniyên şer biçînin û her wiha mayinên ku çeteyan li herêmê bi cih kirine, li ser jiyana şêniyan xetere ne.
Osman destnîşan kir ku guhertina avhewayê, nebarîna baranê di zivistanê de û faktorên din ên avhewayê bi awayekî neyînî bandor li çandiniyê kir. Osman da zanîn ku




ji ber daketina pileyên germahiyê heta binî sifirê, sebzeyên zivistanê telef bûne.
Her wiha Basim Osman diyar kir ku li gorî plansaziya îsal, dê berhemên bejî mîna genim û ceh, bequlî û berhemên avî mîna petat, pîvaz, bacanên sor, xiyar, îsot, gijnîj û kemûnan biçînin.
***ANHA***

# "Armanca Komîteya Hevpeymana Civakî nerîneke hevbeş e"

**Hevseroka meclisa Ermen ya Kantona Hesekê û Endama Komîteya reşnivîsa Hevpeymana Civakî ya Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Erîv Qesebiyan da zanîn ku Hevpeymana Civakî wê gelê Ermen jî weke hemû gelên dinê yên li ser vê erdnîgariyê ji komkojî, kuştin û helandina çandî û dîrokî biparêz e û got: "Me hem meclisa xwe ava kiriye û di binê wê de xwe brêxistin kiriye, hem di aliyê parastinê de hêza me heye di binê QSD'ê de xwe birêxistin kiriye. Ev mîsogeriya wê yekê ye ku careke din emê destûrê nedin komkujiyan û li hemberî helandinê parastinê bikin.**

Di nava şerên ku li Rojhilata Navî û giştî cîhanê de bi pergalî û hevalbendî diqewimin, hemû gelan û pêkhate para xwe ji kuştin, revandin, îşkence û helandina nasname û hebûnê girtiye û hê jî digirin. Di nava gelê heyî yê resen ku koka wan vedigere hezarê salan, bi êrîş û xeteriya qirkirinê re rû bi rû dimînin. Ermenî, yek ji gelên ku di van pêvajoyên qirkirin û helandinê de rastî êrîşên pir alî hatine.



Imparatorîya Osmaniyan û hevkarên wê di Gulana 1915'an de fermana nefiya Ermeniyan da. Li dijî gelên xwecihî yên Ermen ku li ser erdnîgariya Mezopotamya û Anatolîya dijîn qirkirin pêkanî. Gelê Ermenî û Asûrî-Suryanî-Kildanî, bi armanca ku bi dirok û kultura wan ve ji holê rakin qir kirin. Ev qirkirin li dijî mirovahîyê sûcek e ku ne mumkun e bê inkar kirin. Li gorî belgeya berçav û heqîqî hejmara kuştiniyan ji milyonek û nîvan zêdetir e. Di heman demê de bi hezaran jî neçarî koçberiyê bûn. Koçberiya pêk hat û pergala netew dewletê ya dihat meşandin bû sedem ku gelê Ermen ziman, çand û dîroka xwe jibîr bikin.
Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bi hezaran pêkhateyên Ermen ên ji van hemû çerxên qirkirinê rizgarbûyî dijîn. Ermenên li ser vê erdnîgariyê jî weke hemû pêkhateyên dinê bi despêkirina şoreşa Rojava re rengê xwe diyar kir û di bin banê Rêveberiya Xweser de bi nasnama xwe ya netewî xwe rêxistin kirin. Di bin banê QSD'ê de jî hêza xwe ya parastinê ava kirin. Rêvberiya Xweser di 15'ê Tîrmeha 2021'ê de ragihand ku dê komîteya reşnivîsa Hevpeymana Civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê amade bike û li gorî wê ji hemû pêhateyan endamên tevlî vê komîtê bibin xwestin. Komîte bi beşdarbûna hemû pêkhateyên herêmê ji 158 kesan pêk hat.Têkldarî vê mijarê Hevseroka Meclisa Ermen a Kantona Hesekê Erîv Qesebiyan ku bi zimanê wê yê Ermen tê wateya Roj ê ji ajnasa me re nirxandin kir.

**"Pergala dewlet-neteweyê nasname û hebûna pêkhateyan dihelîne"**

Erîv Qesebiyan têkildarî êrîşên li ser gelên xwecihî ku ji dîrokê heya niha dom kiriye ev tişt got: "Di dîrokê de di sala 1915'an de Imparatorîya Osmanî li dijî gelê Ermen, suryan, Aşrû û Kildan komkojiya Sêfo (Şûr)pêk anî. Çima nav kirin Sêfo ji ber ku di wê demê de bi sêfan serî serjêdikirin . Bi armanca helandina nasname û hebûna wan ev komkojî pêk hat û heya roja îro jî li Ermîniya, li Serêkaniyê, Efrîn,Şengal dewam dike.dewleta Tirk dixwaze Imparatorîya Osmanî zindî bike û qetilam pêk bîne.Di heman demê de li Sûrî sîstema yek alî,netew, ziman dihat meşandin ev jî bû sedema gelê Ermenî yê ku li Sûrî jiyan dike ziman,dîrok, çanda xwe jibîr bike ."

**"Me di binê banê Rêvberiya Xweser de hebûna xwe misoger kir"**

Erîv teqez kir ku Şoreşa Rojava hebûna pêkhateyên herêmî ji tunekirinê parast û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di Şoreşa Rojava de, me pergala Netewa Demokratîk nas kir, di vê pergalê de her kes bi rehetî dikare bi ziman, dîrok, çand xwe tevbigere û xwedî li nasnameya xwe derkeve. Wekî gelê Ermenî me meclisa xwe ava kir, civîn ji bo gelên Ermenî hatin çêkirin. Di civînan de me behsa ziman, çand , dîroka xwe kir ku çawa siyastek helandinê li ser me hate meşandin. Ya girîngtirîn ku me zarokên xwe yê Ermenî fêrî zimanê dayikê kir û niha jî di meclisê de em wan perwerde dikin. Ev gavên pîroz û serkeftî ne. Rêvberiya Xweser di 15'ê Tîrmeha 2021'ê de komîteya reşnivîsa hevpeymana civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê amade kir,raghand .Bi armanca xwedîderketina li sibe roja gelê Ermen Ez wekî nûnerek tevlî komîteyê bûm.Di dîroka mirovahiyê de ev cara yekem e pêkhate dikarin cihê xwe di reşnivîsa hevpeymana civakî de bigrin. Armanca tevlîbûna hemû pêkhateyan ji reşnivîsa Hevpeymana Civakî ewe ku ji gelek nerînan nerînek hevbeş xizmeta hemû pêkhateyên herêmê bike derkeve holê. Gelê Ermenî di nava rûpelê dîrokê de gelek êş ji pergala desthilatdar ve kişand, ev êş hemû pêkhate jî têre derbas bûne lewma em bawerin ku Hevpeymana Civakî dê çareseriyek ji kirîza Sûrî re bibîne û pêşerojek azad were ava kirin".
***ANHA***



# Çeteyên dewleta tirkî ji Efrînê digel melayê mizgeftê 10 welatî revandin

**Çeteyên dewleta tirkî ji navçeya Reco û Cindirêsê yên kantona Efrînê 9 welatî û ji navenda Efrînê jî melayê mizgeftê revandin**

Çavkaniyan ji navçeya Cindirêsê ya kantona Efrînê ya dagirkirî ragihand ku çeteyên "Feyleq El-Şam" ên girêdayî dewleta Tirkan welatiyê bi navê Şakir Şêxo (36) yê ji gundê Celeme yê Efrînê revand. Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi hicetên nerast welatiyan direvînin û li hember serbestberdana wan, fîdye ji malbatên wan dixwazin.
Bi mijarê ve girêdayî çavkaniyan ji navçeya Racoyê ragihand ku çeteyên "polîsên leşkerî" yên dewleta Tirk a dagirker welatiyê bi navê Xelîl Mihemed Mistefa (22) ê ji gundê Badîna yê navçeya Raco revand. Piştre ew bir navenda xwe ya sereke ya li navçeyê. Çeteyan îdia kir ku têkiliyên Xelîl Mihemed Mistefa bi Rêveberiya Xweser re hebûn.
Çeteyên "polîsên leşkerî" beriya du mehan Ajar Mistefa ku birayê Xelîl Mistefa ye revandinbû û hîna jî çarenûsa wî nediyar e, ji ber ku malbat nekarî fîdye bide çeteyan.
Çavkaniyan daxuyand ku çeteyên "Firqet El-Hemzat" 5 welatî revand, ji wan kalemêrek û jinek ji gundê Qude yê navçeya Raco. Çeteyan ew birin cihekî ne diyar û hîna jî çarenûsa wan eşkere nebûye.
Her wiha heman çavkaniyan navên kesên hatine revandin bi bîr xistin: Hisên Mihemed Hemo (75), Selah Menan Şêxo, Şukrî Hisên Bakîr (50), Mihemed Mihemed Heyder û Asya Hisên Mûsa (60).
Li gorî çavkaniyan piştî dagirkirina Efrînê sala 2018`an jina bi navê Asya Hisên Mûsa hatibû revandin û li girtîgeha Hewar Kilis a girêdayî çeteyên Sultan Murad hatibû girtin. Piştre li bermanber fîdyeyê serbest hatibû berdan. Çavkaniyan eşkere kir ku îşknece li Asya hatibû kirin.
Çavkaniyan da zanîn ku çeteyên "polîsên leşkerî" û "El-Hemzat" pênşema derbasbûyî, du bira; Mihemed Fayiq Henan (38) û Hisên Hisên Fayiq Henan ên ji gundê Berbenê yê navçeya Racoyê revandin.
Li aliyê din, li gorî çavkaniyan, MÎT'a Tirkan û çeteyên wê melayê mezingefta mezin Yûsif




Yaqûb Ebdulezîz (67) ê ji gundê Sêmalka yê Mabeta ya Efrînê revandin.
***ANHA***

# Bîlançoya sûcên dewleta Tirkan û çeteyên wê ji destpêka 2022`yan ve

**Berdevkê Rêxistina Mafên Mirovan ya Efrîn – Sûriyê bîlançoya sûc û kiryarên ku dewleta Tirkan û çeteyên wê ji destpêka sala 2022`yan ve li dijî welatiyên resen yên kantona Efrînê pêk anîne, eşkere kirin.**

Ji destpêka ku artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê kantona Efrînê dagîr kirin, hemû sûc û kiryarên dermirovî yên li dijî welatiyên resen yên li gund û bajarokên kantona dagîrkirî mane, didomin.
Berdevkê Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê – Sûriyê bîlançoya sûcên ku ji destpêka sala 2022`yan ve hatine kirin, eşkere kirin.
Berdevkê Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê – Sûriyê Îbrahîm Şêxo wiha got: "Ji destpêka sala 2022`yan ve, artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê her wiha MÎT'a Tirk, 96 welatî ji wan 11 jin û 5 zarok, revandin."
Şêxo wiha domand: "Rewşên kuştinê ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hatine kirin gihaşt 10 welatiyan. Zêdetirî 5 he-





zar darên zeytûnan hatin birîn û 9 cihên şûnwarî hatin wêrankirin."
Şêxo destnîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê daran dibirin, cihên şûnwarî wêran dikin û armanca wan ji vê yekê ew e ku xwezaya Efrînê hilweşînin, bazirganiya êzingên darên wê bikin, nasname û çanda kantona Efrînê ku vedigere hezar salan tune bikin, ev jî bi rêya hilweşandin û diziya cihên şûnwarî, girankirina doprêça li ser şêniyên resen, avakirina mizgeftan li gundewarên êzidîyan da ku wan koçber bikin û demografiya herêmê biguhêrin, pêk tê.
Şêxo piştrast kir ku zêdetirî 18 baregeh ji aliyê komeleyên qeterî, kiwêtî yên îxwanî ve hatine avakirin û herî dawî jî komeleyên filistînî ku bi lez û bi destekdayîna dewleta Tirk, hatin avakirin.
Şêxo di axaftina xwe de îşaret pê kir ku dewleta Tirk bi hemû hêza xwe hewl dide rastiya dagirkirinê li kantona Efrînê bidomîne û wek ku di dîrokê de kiriye wê tev li xaka Tirkiyê bike.
Îbrahîm Şêxo piştrast kir ku çeteyên dewleta Tirk li Efrînê di demên berê de çeteyên DAIŞ`ê bûn û bi vê yekê dagirkeriya Tirk Efrîn kiriya "baregeha dijminatiyê li herêmê" û wiha dawî li gotina xwe anî: "Digel paşguhkirin û bêdengiya civaka navneteweyî dê sûc û binpêkirin dewam bikin."
***ANHA***

# Li Reqa kargeheke teqemeniyan hat dîtin

***Navenda Nûçeyan***

**Hêzên Ewlekariya Hundir li Reqa kargeheke madeyên teqemeniyê ya çeteyên DAIŞ`ê desteser kirin. Di kargehê de madeyên teqînê, madeyên çêkirina bombe û mayînan hebûn.**

Hêzên Ewlekariya Hundir li ser malpera xwe ya fermî ev daxuyanî da: "Hêzên Ewlekariyê li Reqayê 20`ê Sibatê kargeheke kevn a çeteyên DAIŞ`ê desteser kir. Di kargehê de madeyên teqemenî û madeyên çêkirina bombeyan hene.
Odeya operasyonên navendî ragihand ku maleke bi guman li kêleka dêrê heye ku madeyên teqemeniyê tê de hene. Li ser van agahiyan hêzên me û Tîma Endezyariya Bêbandorkirina Mayînan berê xwe dan deverê. Hêzan yekser derdor dorpêç kir û welatî dûrxistin da ku tîm dest bi kontrolkirina malê bike.
Madeyên di malê de hatine dîtin ev in:
-Madeya TNT (1 kg)




- Macûna teqemenî hecm ribek kg (0, 25)
-Mayîn (1)
-Bombeyên destên ên rûsî, 2
-Bombeyeke li herêmê hatiye çêkirin, 1
-Cebilxane cureya (12.5), 2
-Kabsûlên mayînên elektrîk, 30
-Kabsûlên seriyên topan, 6
-Kabsûlên bombeyan, 5
-Mask, 1
Ev made hatin bê bandorkirin, beyîn zirar çê bibin.
Di dawiyê de em bang li welatiyan dikin ku hişyar bin û dema cismên bi guman dîtin, yekser agahiyê bidin navendên hêzên me da ku parastina

# HPG`ê nasnameyên 5 şehîdan eşkere kirin

***Navenda Nûçeyan***

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê nasnameyên 5 gerîlayên li Serhedê şehîd bûyîn eşkere kirin û got, em hevrêyên xwe yên li Serhedê bi tevlibûna xeta fedayîtiyê bûyîn efsane bi rêz û minetdarî bîr tînin û dilsoziya xwe ya bi bîranîna wan re dubare dikin.**

Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê wiha ye: "11'ê Gulana 2017'an li qada Tendurekê ya Eyaleta Serhedê, di dema çalakiya dijî artêşa Tirk a dagirker de ku gelek dagirker hatin cezakirin û dijmin ji Tendurekê hate avêtin, lehengên Serhedê hevrêyên Argeş, Canfeda, Çekdar, Cemal û Nûrhak bi lehengî şer kirin û şehîd bûn. Em van hevrêyên xwe yên bi tevlîbûna li ser xeta fedayîtiyê li Serhedê bûn efsane, bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin û dilsoziya xwe ya bi bîranîna wan re dubare dikin.
Agahiyên li ser nasnameuûm hevrêyên me yên şehîd wiha ne:

Nasnav: Argeş Întîkam
Nav paşnav: Ersîn Seven
Cihê jidayikbûnê: Wan
Dayik-Bav: Besra-Mehmet Emîn
Dem û cihê şehadetê: 11'ê Gulana 2017 / Serhed

Nasnav: Canfeda Rojhat
Nav paşnav: Îbrahîm Başboga
Cihê jidayikbûnê: Agirî
Dayik-Bav: Guzel-Hîkmet
Dem û cihê şehadetê: 11'ê Gulana 2017 / Serhed

Nasnav: Çekdar Ararat
Nav paşnav: Sînan Tekîn
Cihê jidayikbûnê: Agirî
Dayik-Bav: Hatîce-Nîzamettîn



Dem û cihê şehadetê: 11'ê Gulana 2017 / Serhed

Nasnav: Cemal Serhed
Nav paşnav: Gulum Ozden
Cihê jidayikbûnê: Agirî
Dayik-Bav: Felek-Mehmet
Dem û cihê şehadetê: 11'ê Gulana 2017 / Serhed

Nasnav: Nûrhak Serhed
Nav paşnav: Mehmet Guler
Cihê jidayikbûnê: Wan
Dayik-Bav: Emîne-Şevket
Dem û cihê şehadetê: 11'ê Gulana 2017 / Serhed

# Li çola Dêrazorê êrişên çeteyan dewam dikin



**Çeteyên DAIŞ`ê li çolbeyara Dêrazorê êrişî nuqteyeke leşkerî ya hêzên hikumeta Şamê kirin. Di encamê de 2 leşkerên hikumeta Şamê hatin kuştin. Li gundewarê Himsê jî, mayînek bi erebaya efserekî hêzên hikumeta Şamê de teqiya.**

Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR) ragihand ku çeteyên DAIŞ`ê nuqteyeke leşkerî ya hêzên hikumetê li beyara Dêrazorê kirin hedef. Di encamê de du leşker hatin kuştin.
Têkildarî heman mijarê li çiyayê El-Omer ê rojhilatê Himsê mayînek bi erebeya efserekî hêzên hikumeta Şamê ve teqiya. Di encamê de efser birîndar bû û 3 parêzvanên wî hatin kuştin. Li vê herêmê tevgera şaneyên DAIŞ`ê zêde ye.
***ANHA***

# Qîrîna Siweyda, qîrîn û hawara tevayiya gelên Sûriyê ye

**Ednan Xelîfê: Daxwaziyên Civaka Durzî rewa ne û pirsgirêkên wan yên tevayiya gelên Sûriyê ne. Divê Hikûmeta Şamê ji krîzê kûrtir neke û dev ji hişmendiya xwe ya hişk berde.**

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

### Jeopolîtîk û bêalîbûna siweyda

Siweyda herêmeke li başûr-rojhilatê Sûriyê ye û jimara şêniyên wê jî nêzî 500 hezarî ye. Piraniya wan ji civaka Durzî ne. Vê civakê, piştî 2011`an li hemberî krîzê bêalîbûna xwe ragihand. Ango li hemberî her qada siyasî û leşkerî yên li herêma erebî ya Sûriyê, bêhelwesbûna siyasî hilbijart. Civakê tevî ku herêma wê di binê kontrola artêşa Şamê de bû, tevlî artêşê nebû û li hemberî her xeterê xwe parast.

Li gorî bûyerên qewimîn, diqwimin û nirxandinan, vê helwesta civaka Durzî, hem hikûmeta Şamê, hem çeteyên weke Cebhet EL-Nusra yên li ser sînorê wê yê rojhilat, aciz kirin. Lewra Cebhet EL-Nusra ji herêma De`ra bênavber êrişî Siweyda dikir. Ku heta meha 7`an ya 2018an bi peymana garantoriya Rûsya li hevkirinan ji De`ra derket. Ji aliyê din ve hikûmeta Şamê bi siyasta tevlîhevkirinê ku li gorî malpera Siweyda 24 ya nûçeyan, bi revandin û kuştinê xwest civaka Durzî bitirsîne. Li gorî şopdarên rewşa Sûrî êrîşa DAIŞ`ê ya sala 2018`an ya li gundewarê Siweyda ku di encamê de 240 qurban çêbûn û piraniya wan sivîl bûn, bi organîzekirin û plana hikûmeta Şamê bi armaca tirsandina civakê bû.



### Xwepêşandan li Siweyda ne û krîz ya tevayiya Sûriyê ye

Li hemberî van kiryaran, civakê Durzî li dijî kiryarên hikûmeta Şamê xwedîhelwest bû û dirûşm û daxwaziya xwe guhertina sîstema desthilatar bûn. Weke xwepêşandanên berfireh yên Tîrmeha 2020`an û xwepêşandanên 3`yê Sibatê yên heta niha didomin, li dijî rewşa xerab ya aborî û kiryarên Hikûmeta Şamê.

Li gorî detayên li ber çavan, li herêmên di binê desthilata Şamê de pirsgirêk rojbiroj pirtir dibin. Ji ber hişmendî û demogojiya desthilatê, ji De`ra heta Dêrazorê û herî dawî Siweyda, ne pirsgirêkên aborî tenê –ku herî dawî bi biryara heman desthilatê alîkarî ji nêzî 500 hezar malbatî hat qutkirin- pirsgirêkên ewleyî, civakî û her cureyê pirsgirêkan di nava civakên herêmê de, kûrtir dibin.

Li ser rewşa Siweyda berdevkê Meclisa Ciwanên ya Partiya Paşroja Sûriyê-şaxê Minbicê Ednan Xelîfê ji me re axivî.

### `Hişmendî û demogojiya Hikûmeta Şamê Sûriyê ber bi tariyê ve dibe`

Xelîfê diyar kir ku ji ber navendîbûna hişk ya desthilatê ya Sûriyê, gel û civak tên paşguhkirin. Di encamê de pirsgirêk kûrtir dibin. Hikûmeta Şamê her tim bi heman xewn û xeyalan ku desthilatê û gelan vegerîne rewşa berî 2011`an, tev digere. Xwepêşandanên niha jî bersiva vê hişmendiya ku bi dehên salan Sûriye pê tê birêvebirin in. Jixwe nirxandina xwepêşandanan di çarçoveya daxwaziyên aborî tenê de, pir şaş e.

Li ser helwesta hikûmeta Şamê, Xelîfê ev nirxandin kir :"Aloziya li sûriyê ev 11 sal in didome û hişmendiya desthilata Şamê hê nehatiye guhertin. Desthilatî bi demogojiyê nêzî daxwaziyên mafên welatiyan dibe. Bi saziyên xwe yên leşkerî bersiva mafên gelan û civakan yên rewa dide, xwepêşandanan bi çekdaran dorpêç dike û dixweze deng jî gel dernekeve. Ev hişmendî bûye sedem ku ne li Siweyda tenê, li De`ra, Dêrazorê û seranserê Sûriyê pirsgirêkên civakê pirtir bibin."

### `Rêveberiya Xweser çareya Aloziya Sûriyê ye`

Berdevkê Meclisa Ciwanên ya Partiya Paşroja Sûriyê-şaxê Minbicê Ednan Xelîfê, derbarê daxwaziyên xwepêşanderan û çaerseriya aloziya Sûriyê de axivî û gotina xwe wiha qedand: "Daxwaziyên civaka Durzî rewa ne. Bi navendîbûna biryaran li Sûriyê teqez dibe ku pirsgirêkên civakan nehên çareserkirin. Mayîna hikûmetê li ser vê hişmendiyê wê aloziyê kûrtir bike û welat ber bi tariyê ve bibe. Aramnc û daxwziyên civaka Durzî û ya her kesî li Sûriyê avakirina rêveberiyeke xweser e. Lewra mînaka Rêveberiya Xweser ya heyî bû bersiva pirsgirêkên gel û û civakan. Herwiha divê biryara 2254 pêk were û alozî bi diyalogeke Sûrî-Sûrî ku nûnerên gel û civakan yên rast, bê despêkirin. Em jî wek Meclisa Ciwanên Partiya Paşroja Sûriyê û gelên herêmê xwepêşandanên Siweyda rewa dibînin û piştgiriya wan dikin."

# KCK: Ziman ji bo gelekî nasname û azadiya ramanê ye

**KCK'e Roja Zimanê Dayîkê ya Dinyayê pîroz kir û got , ziman ji bo gelekî nasname ye, azadiya ramanê ye, hebûn e; em li nasnameya xwe, azadiya xwe û hebûna xwe xwedî derkevin. Ziman beden e, li bedena xwe xwedî derkevin.**




Komîteya Perwerdeyê ya KCK'ê bi pêmana 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Dinyayê peyamek weşand.

Di peyama KCK'ê de ev xal hatin diyarkirin:

"Ziman ji bo gelekî nasname ye, azadiya ramanê ye, hebûn e; em li nasnameya xwe, azadiya xwe û hebûna xwe xwedî derkevin. Ziman beden e, li bedena xwe xwedî derkevin.

Roja Zimanê Dayîkê ya Dinyayê di serî de ji Rêber Apo re ku hêviya azadiya gelekî ya çand, nasname, ziman û hebûna wê hatî qedexekirin û tine hatibû hesibandin gihand asta têkoşîneke bêhempa û di vê rê de ti astengî nas nekir, li şehîdên me yên nemir ku di riya hebûn, ziman, nirx û azadiya gelê xwe de mirin weke bidawîbûnek nedîtin û xwe gihandin nemiriyê, her wisa li gelê me yê berxwedêr ku di gel her cure qedexe, zext, çewisandin, îşkence û înfazan stranên bi zimanê xwe gotî, çîrokên mêrxasiyê vegotî, dengê tilîliyên xwe bilind kirî û li hemberî neyar çok nedanî, pîroz be.

Ziman ku yek jê hêmana herî sereke a mirovbûn û civakbûnê ye, di afirandin û pêşxistina çanda civakî de jî hêmana sereke û amûra danûstandinê ye. Di vê wateyê de her zimanek hilgirê çandekî ye jî.

Ziman ne tenê hêmana bingehî a avabûna hişmendiya civakî, di heman demê de hêmana bingehîn a avakirina civakî ye jî Gelekî dema xwedî li zimanê xwe derbikeve dibe gel û bi tenê wisa dikare civakbûna xwe biparêze û pêşde bibe. Di vê wateyê de ziman hîma sereke a bîra hevpar e. Pêşketina civakê hemtayê pêşketina ziman e. Berevajî wê jî rast e; civaka zimanê xwe wendakirî, ev civak e ku hebûna xwe jî wenda kiriye. Ji ber ku ziman jî weke çand bîra hevpar a civakan e; tê wateya daneheva hişmendiya civakî, raman, hest û nirxên civakî û teyisandina wan. Civakekê bi çiqasî zimanê xwe yê zikmakî xurt kiribe, ewqasî jî standardên xwe ên jiyanê xurt kiriye. Civaka zimanê wê hatî qedexekirin, ê zimanê xwe wendakirî û ê ketî bin destê dagirkerî û serdestiya zimanên din, ew civak e ku bi dagirkerî, bişaftin û qirkirinê re rû bi rû hatiye hîştin.

Li gel pêşketina kapîtalîzmê polîtîkayên fermî ên dewletan ji destpêkê heya îro li hember hebûna zimanan metirsiyeke jiyanî ye. Di destpêka sedsala 20'an û pê de li gelek deverên cîhanê bi sedema dewlet-netewên yekdest ên hatî damezrandin, gelek welat bûne goristana zimanan. Netewe-dewlet bi polîtîkayên xwe ên qirkirina zimanî û çandî, di hemû qadên jiyanê de perwerdeya bi yek zimanî wek neçariyekî li ser gelan ferz kirine. Riya sereke a bişaftina civakeke qedexekirina zimanê wê civakê ye. Bê şik, ji bo civakekê wêraniya herî mezin ev e bi zimanê xwe neaxive, zimanê xwe ji bîr bike û ji zimanê xwe dûr bikeve. Eşkere ye ku civaka zimanê xwe ji bîr kiriye, bi mîsogerî wê çanda xwe, dîroka xwe, nasnameya xwe û herî dawî jî wê bîra xwe wenda bike. Ev yek qira civakî ye ku ji hêla hişê netewe-dewlet bi domdarî tê meşandin.

Di vê wateyê de bi riya şoreşa ziman ku beriya bi deh hezaran salî li ser xakên Kurdistanê bi pêşengiya jinên Kurd hatî pêşxistin, di gel ku mohra xwe li pêşketina mirovahiyê daye, îro li ser heman xakî ji gelê me yê şoreşa ziman pêşxistî re di zimanê xwe de xwendin, nivîsandin, stran, siyaset, ken, girî û heta wek Apê Musa gotî fîtiklêdan jî hatiye qedexekirin.

Em Komîteya Perwerdehiyê ya KCK'ê bi boneya Roja Zimanê Zikmakî ya Dinyayê careke din diyar dikin ku; mafê perwerdeya zimanê dayikê û bi rengekî wekhev sûdgirtina ji vê mafekî gerdûnî ye. Di vê wateyê de daxwaza perwerdeya bi zimanê dayikê ji hemû daxwazên din meşrûtir e. Divê em ji bîr nekin ku zimanek ne ji bo ku yên pê diaxivin kêm in; ji bo ku yên pê dizanin neaxivin, xwedî lê dernakevin û ji bo wê tênakoşin tune dibe, dimire. Lewra pêwîst e gelê me li her cihê lê ye axaftin û nivîsîna bi Kurdî wek çalakiya nemiriya zimanê dayikê bibîne, li her cihî, têkoşîna mîsogeriya perwerdeya bi zimanê dayikê û rakirina astengiyên zagonî a li pêş bikaranîna zimanê dayikê têkoşîneke bi hêz û domdar bimeşîne û ti caran rê nede polîtîkayên bişaftinê ên bi feraseta yekzimanî. Bi vê boneyê Roja Zimanê Zikmakî ya Dinyayê careke din li gelê me û ji hemû gelên têkoşer re pîroz be."

***Çavkanî: ANHA***



## Li peyaman û mohrên xwe xwedî dernakevin!

**Dilyar Cizîrî**

Roja zimanê dayîkê ya cîhanî 21'ê Sibatê ji aliyê UNESCO ve sala 1999'an wek rojeke fermî hat binavkirin. Dîroka vê rojê vedigere sala 1952'yan roja tevgera ziman ya Bengalî li rojhilatê Pakistanê ji bo zimanê xwe, dest bi xwepêşandan û çalakiyên cûrbecûr kir. Polîsan êrişî xwendekaran kir û hejmarek ji wan kuştin.

Ev berxwedana gelê Benladeşê di sala 1956'an de biencam bû û zimanê bengalî bû zimanekî fermî. Biryara UNESCO yê ya hilbijartina vê rojê wek roja zimanê dayîkê ne tiştekî ji rêzê ye, lê pirsa pêwîst e were kirin, ji sala 1999'an ve çiqas li vê biryara xwe xwedî derketine û ji bo parastina zimanên dayîkê li seranserî cîhanê çi gav avêtine.

Heger em behsa dewleta Tirkan bikin, kurdî jî di nav de 18 ziman hatine qedexekirin û hejmarek ji wan hema bêje hatine tinekirin. Niha jî dewleta Tirkan siyasetên xwe yên inkar û tunekirinê derheqê zimanê kurdî didomîne. Li rojhilatê Kurdistanê gelê Kurd bi siyasetên inkar û tinekirinê re rûbirû hatine hiştin, mamosteyên ziman bi salan cezayê girtîgehê li wan tê birîn.

Heger em behsa Iraqê bikin, tevî li Başûr herêmeke fedral heye hikûmeta Bexda li Kerkûkê bi riyên cûda siyasetên guhertina demografî û qedexeyan li ser zimanê kurdî feriz dike.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê jî tevî sîstemeke demokratîk a Rêveberiya Xweser hatiye avakirin, gelê herêmê bi awayekî fermî zimanên kurdî, erebî û suryanî kirine sîstema perwedeyê û maf ji pêkhateyên din re jî hatiye dayîn ku bi serbestî zimanên xwe fêr bibin û bi kar bînin. Hê jî UNESCO ya biryara roja zimanê dayîkê ya cîhanê daye naxwaze vê sîstemê nas bike.

Di heman demê de hikûmeta Şamê li ber çavên wan û bi fermiyeta ji NY'yî girtiye siyasetên xwe yên li dijî sîstema perwedeyê ya Rêveberiya Xwerser ferz dike û bi gelek rê û rêbazan şerê sîstema perwedeyê ya Rêveberiya Xweser dike.

Derbarê helwesta saziyên navdewletî derabrê sîstema perwedeyê ya li bakur û rojhilatê Sûriyê de, rayedarên saziyên perwedeyê dibêjin ku her dem ew sazî dibêjin, niha ne dema wê ye, niha mijara ziman bihêlin. Di vir de jî careke din dubare dibe ku UNESCO û saziyên navdewletî durûtiya xwe dubare dike û xwedî li biryar û imzeyên xwe dernakeve. Tişta me li jor rêz kirin, hemû li ber çavên wan têne kirin. Rojekê jî ji bo parastina zimanekî destwerdan nekirine û alîkarî pêşkêş neteweyên zimanên têne tinekirin, nekirine.

Ji ber wê jî pêwîst e gelê me û bi taybetî saziyên perwedeyê xebatên xwe yên pêşxistina zimanê dayîkê bidomînin û li benda ti aliya nemînin.

Ji xwe jî saziyên Rêveberiya Xweser niha wisa dikin, dema SZK'ê biryara ketina dibistanên fermî da, gelek kesan got ev şaş dikin û sîstema perwedeyê derbe dikin. Piştî wê bi demekê hikûmeta Şamê dibistan girtin û xwestin zextê li SZK'ê bikin. Lê israra xebatkaran û vekirina dibistanan, a wê demê em dibînin îro vekirina zanîngeh, peymangeh û her wekî din bi encam dibe. Ji lewma niha bar girantir dibe û pêwîstî pê heye, em rojê wekî 21'ê Sibatê bikin rojê biryardayîn û pêşxistina zimanê dayîkê.



# Tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan qanûnên navneteweyî binpê dike

**Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku armanc ji tecrîdkirina Rêber Abdullah Ocalan ne şexsê rêbertiyê tenê ye, armanc şkandina vîna gelê Kurd e, bi taybetî vîn û hêza jinê ye. Herwiha bang li rêxistinên navneteweyî yên parastina mafê mirovan kirin ku zorê bidin dewleta tirkî ya dagîrker.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

24 sal in Rêber Abdullah Ocalan li zindana Îmralî di binê tecrîdeke giran de ye. Dewleta tirkî û hêzên komploger yên pê re alîkar xwestin bi vê komployê gelê Kurd tine bikin û ji felsefeya rêbertiyê qut bikin. Ji bo wê jî Tirkiye bi salan e tecrîdeke giran li ser rêbertiyê bi kar tîne. Rojbiroj tecrîdê girantir dike û derfetê nade malbat û parêzerên wî pê re biaxivin. Herî dawî 25'ê Adara 2021ê Rêber Abdullah Ocalan bi telefonê bi birayê xwe Mihemed Ocelan re axivî, lê piştî çend deqeyan axaftin hat qutkirin û ji wê demê ve ti agahî ji Rêbertiyê nehatina girtin. Ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, herwiha şermezarkirina kiryarên Tirkiyê yên ku dewamkirina komployê dikin,



jinên bajarê Qamişlo nêrînên xwe ji me re anîn ziman.

Jina bi navê Siltanê Omer da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze bi vê tecrîdê Rêbetiyê ji gel qut bike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tirkiye derfetê nade ku rêbertî bi malbat parêzer û hevalên xwe re biaxive, herwiha naxwaze ti kes agahiyan jê bigire. Da ku gel ji Rêberê xwe dûr bikeve û îradeya gelan bişkîne. Girtina rêbertî sûcek li dijî mirovayiyê ye û ne li gorî qanûnên navneteweyî ye jî. Çimkî rêbertî kesayeteke siyasî ye û ji bo azadiya gelan têkoşînê dike." Siltanê di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Li gorî pîvanên navnetewî yên mafê mirovan divê kesê di girtîgehê de rastî işkenceyê nebe. Herwiha mafê wî ye ku daxwaziya hevdîtina malbat, parêzer û hevalên xwe bike û divê ji mafê xwe yê jiyanê qut nebe."

### `Wê têkoşîna me bênavber dewam bike`

Jina bi navê Wetfa Îbrahîm jî bîr xist ku armanca Tirkiyê ji tecrîdkirina



Rêber Apo, tinekirina projeya neteweya demokratîk e ya ku bi fikirê Rêbertiyê hatiye avakirin û axaftina xwe wiha domand: "Tirkiye dixwaze destkeftiyên gelê Kurd têk bibe, herwiha projeya neteweya demokratîk û biratiya gelan têk bibe. Yê ev proje danî rêbertî bû. Ji bo wê jî naxwazin rêbertî ji zindanê derkeve, da ku gelê Kurd mafê xwe bi dest nexe û Kurdistaneke serbixwe neyê avakirin." Wetfa got, em şagirtên Rêber Apo ne. Tirkiye û hevkarên xwe çiqas tecrîdê giran bikin û êrişan zêde bikin, emê jî li baramberî wê hê zêdetir gavan biavêjin. Ti kes nikare me ji rêberê me qut bike, wê têkoşîna me bênavber dewam bike. Emê her roj dengê xwe bigihînin sazî û rêxistinên navneteweyî da ku Rêberê xwe ji zindanê azad bikin.

### `Azadiya Rêber Apo azadiya jinê ye`

Hediya Derwêş jî teqez kir ku azadiya Rêber Apo azadiya jinê ye û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Wek jinên bakur û rojhilatê Sûriyê heta ku rêberê xwe fîzîkî azad nebînin em ranawestin. Çimkî yê ku hêza jinê ava kir û derfet da jinê ku bibe xwedî fikir û felsefeyeke azad rêbertî bû. Ji bo wê jî emê her tim ji bo azadiya Rêberê xwe têkoşîn û berxwedana xwe zêdetir bikin."

Hediya Derwêş axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Emê ji 7 salî heta 70 salî têkoşînê bikin. Gavên ku Rêbertî bi berxwedan dest pê kirin, emê berdewam bikin."



# TEV-DEM: Projeya neteweya demokratîk hêviya gelan e

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

**Hevseroka TEV-DEM`ê: Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi taybetî gelê Kurd wê li seranserê cîhanê, bi têkoşîna xwe armanca Komploya Navneteweyî têk bibin.**

Bi armanca têkbirina tevgera azadiyê, 15'ê Sibatê 1999`an bi Komployeke Navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, dîl hat girtin. Gelê Kurd ev roj wek "Roja Reş" îlan kir û her sal di vê rojê de gelê Kurd û gelên azadîxwez çalakiyên li dijî komployê li seranserê cîhanê li dar dixin.

Li ser Komploya Navneteweyî û rewşa heyî, hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed ji rojnameya me re ev nirxandin kir.

### `Gel bangewaziya projeya neteweya demokratîk dike`

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed di destpêka axaftina



xwe de Komploya Navneteweyî ya di sala 24`an de şermezar kir. Rûken Ehmed diyar kir ku, bangewaziyên gelê Siweyda ji bo projeya neteweya demokratîk, gaveke ji gavên gelan yên ku hêviyên xwe di pirojeya neteweya demokratîk de dibînin. Rûken axaftina xwe wiha domand: "Bangewaziya gelê Siweyda tê wateya ku, li hemberî êrişên dagîrkeriyan, hişyariyek çêbûye. Bêguman hêzên serdest vê yekê ji bo xwe wek xeter dibînin. Di vê dema dawî de mirov vê yekê dibîne, siyaseta ku dewlet li ser gelan dimeşîne, bêbandor e."

Li ser êrişên dewleta tirkî ya dagîrker bi taybetî yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê Rûken Ehmed wiha axivî: Ji bilî ku dewleta tirkî ber hilweşanê ve diçe, herwiha sala 2023`yan lihevkirina Lozan jî bi dawî dibe. Ji ber vê dewleta tirkî ya dagîrker nerehetiyê di nava gel de çêdike.

Rûken bi van gotinan dirêjî da axaftina xwe: "Gelê Kurd herwiha pêkhateyên herêmê jî, bi têkoşîna xwe ya li seranserê cîhanê, sala 2022`yan kirin sala berxwedanê. Herwiha bangewaziyên gelan ji bo azadiya Rêbertiyê jî, di asteke pir bilind de bû. Gel bi sloganên xwe ji bo rakirina tecrîda giran ya bêmaf ser Rêbertiyê, di çalakiyên 15`ê Tebaxê de, nameya xwe ji cîhanê re, anîn ziman. Tişta herî girîng ku di van salên dawî de bala cîhanê dikşîne, biratiya gelan e. Ev yekîtî armanc û planên dijmin têk dibe."

### `Rêber Apo ne Rêberê Gelê Kurd tenê ye, Rêberê Gelan e`

Hevseroka TEV-DEM Rûken Ehmed axaftina xwe wiha berdewam kir: "Bi hêrsa ku gel radibin ser piyan, hişyarbûna xwe ya li hemberî dagîrkeriyê nîşan didin. Lewra gel li ser proje, fikir û felsefeya Rêbertiyê dixebite. Ji ber vê yekê em dibêjin, Rêber Apo ne Rêberê Gelê Kurd tenê ye, lewra hêviya azadiyê ya hemû gelan di projeya neteweya demokratîk de heye. Em dikarin vê yekê jî bêjin, ji milê siyaset, rêxistin, xweparastin û diplomasiyê de, pêwîstiya gelan bi projeya neteweya demokratêk heye."

Rûkenê got, ji bo çareserkirina aloziya Rojhilata Navî, azadiya Rêbertiyê pir girîng û pêwîst e. Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Rûken Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo azadiya Rêbertiyê herwiha ya herêmên me yên di binê dagîrkeriyê de, ya herî pêwîst xurtkirina yekîtiya biratiyê ye. Hêviya me ew e ku, ev sal sala azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û her çar perçeyên Kurdistanê be."



## Krîza Ukrayna û Konferansa Mûnîhê

**Zekî Bedran**

Krîza Ukrayna her ku diçe kûrtir dibe. Berî niha Rûsya Kirim dagîr kir. Herêmên weke Dombas û Donats xweserî heta mirov dikare bêje serxwebûn ragihandin. Welatên Rojava bertekeke mezin nîşan nedan. Baş e çima niha hinkir maye ku şer derkeve? Ev mijar pir tê gotûbêjkirin. Amerîka dixwaze Ewropa bike yek û NATO çalak bike û wan bikişîne cem xwe. Ji bo wê dixebite li Ewropaya rojhilat bi kûrkirina krîzê li hemberî Rûsya bertekê diyar bikin.

Rûsya di warê aborî de nikare bi Rojava re hemberiyê bike. Li Ukrayna şer derkeve Amerîka û Ewropa leşkerên xwe nadin kuştin. Jixwe di warê leşkerî de nakevin nava şer. Dibêjin emê Ukrayna biparêzin û ambargoyên bibandor daynin ser Rûsya. Bênavber çek dişînin Ukrayna. Depoyên Amerîka û Ewropa tijî ne. Ji bo şerîkeyên çekan bazad çêdibe. Ji bo wê yên bi ser bikevin wê ew bin. Weke din eger şer derkeve wê ne li ser erdê wan be. Yên zererê bibînin wê Ukrayna û Rûsya bin û yên bimirin jî wê ji gelên wan bin. Rûsya jî wê demeke dirêj tengayiya aborî bikişîne.

Ya rast Rûsya hat zetimkirin, mirov dikare bêje ket nava davikan. Demeke dirêj bi gelê Ukrayna re di nava heman federasyonê de bûn. Bi hev re dijiyan. Niha amadekariya şerê hev dikin. Di encamê de yên winda bikin wê ev gel bin. Rûsya dibêje NATO nêzîkî sînorê min bibe wê ewleyiya min bikeve xeterê. Ji bo wê ez ji bo berdêlê amade me. Divê nişan bidim ka çiqas cidî me. Lê Amerîka û NATO zorê didinê. Ya rast Rûsya şer naxwaze. Dizane ku wê berdêla wê giran be. Lê tişta bi ser de disepînin jî ne ya qebûlkirinê ye. Ji bo wê ketiye tengayiyeke mezin.

Di vê navê de li Mûnîhê `Konferansa Ewlekariyê` hat çêkirin. Ev civîn her sal dibin. Lê ya îsal di dema krîza Ukrayna de pêk hat. Ukrayna bû navenda konferansê. Amerîka hem di asta jor de hem bi sî endamên kongreyê tevlî bû. Amerîka xwe li wir nîşan da. Ji bo ku hêzên hatîn vexwendin di eniya li hemberî Rûsya de ciyê xwe bigirin pir xebitîn.

Aliyekî vê konferansê jî ya balkêş ji rêveberiya başûrê Kurdistanê tevlîbûna Barzaniyan bû. Bêguman wê Kurd vê mijarê binirxînin. Başûr ne dewleteke cuda ye. Di fermiyetê de herêmeke federe ya di nava sînorên Iraqê de ye. Ragihandinê diyar nekir ku serokwezîrê Iraqê û di asta jor de ji rêveberiyê tevlî bûne. Serokê herêma Kurdistanê û serokwezîr Mesrûr Barzanî tevlî bûn. Hikumeta li Başûr koalisyon e. Jixwe Nêçîrvan tevlî bûbû, qet nebe dibû ku ji şirîka hikumetê YNK Qubad Telebanî tevlî bibe. Tê zanîn ku di navbera Nêçîrvan û Mesrûr de nakokî hene. Baweriya wan bi hev nayê. Hulusi Akar dibêje, em bi Barzaniyan re li ser mijara terorê û hevkariyê axivîn. Erdogan jî piştî axaftina bi telefonê ya bi sekreterê gişî yê NARO Stoltenberg re got, li hemberî terorê xwestina alîkariyê ji NATO mafê me yê herî xwezayî ye. Rayedarên Tirkan dema behsa terorê dikin mebesta wan ne DAIŞ yan jî El Nusra ye. Tersê wê li hemberî Kurdan hevalbendên hev in. Hevdîtina bi Barzaniyan û NATO re li ser kuştin û tesfiyekirina Kurdan e, Kurdên li hemberî dewleta tirkî serê xwe danaynin. Jixwe roja bi balafiran li Şingal, Mexmûr û Rojava dayîn Erdogan gazî Nêçîrvan kiriye û tiştên ku bikin plan kiribûn.

Eger em bala xwe bidinê ji gelek beşên Kurdan gazî PDKê kirin. Gotin çekdaran neşînin herêmên gerîla, em şerê di nava Kurdan de naxwazin. Lê ji Barzaniyan ti kes derneket hemberî gel û gotineke dilê gel xweş bike negot. Negotin niyeta me ya şer nîne, soza me berê dayî Kurdan em pê ve girêdayî ne, wê birakujî nebe. Tersê wê, gotin, Erdogan ne dijminê Kurdan e, yên dibin sedema êrişan PKK û gerîla ne. Êrişên dagîrkirinê û komkujî rewa kirin.

Yên Rojhilata Navî hinekî nas dikin û dizanin ka dewleta tirkî derheqê Kurdan de çi dihizire, wê bizanin ku ev hevdîtin ne ji bo xêrê ne. Dewleta tirkî jixwe kengê dixwaze êrişî başûrê Kurdistanê dike. Rojane êrişî Rojava jî dike û komkujiyan dike. Li Rojava Amerîka û Rûsya hene, ji bo ku tevgera dagîrkirineke mezin dibe ku pêdiviya wê bi destûra wan hebe. Lê ji bo Başûr pêdiviya wî nîne. Jixwe ji bo êrişên dagîrkeriyê serbest tev digere. Ji bo wê rojên bixeter li benda Kurdan in. Dewleta tirkî ji bo rojên pêş amadekariya êrişên ji sala borî girantir dike. Sala borî gerîla berxwedaneke mezin kir. Dewleta tirkî encam negirt. Digel bikaranîna çekên kîmyayî. Divê Kurd bizanin ku wê şer girantir bibe. Hikumeta heyî hikumeta şer e. Pêdiviya wan bi lêxistina Kurdan û serkeftinê heye. Di rewşa heyî de şansê